 *Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*

 *wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

# Tîrêjên Çarşembê

## Xelek - 30

# Nivîsîn, Hînkirin, Wêje û Huner li Sûmer

### Nivîsîn û hînkirin:

Dîrokzanê amerîkî *William James Durant* dibêje: "**Nivîsîn tiştê herî nirxdare ku Sûmeran li pey xwe hişt. Wisa tê xuyakirin ku ev huner li ba wan hunereka gelek nirxdar bû, ew bi kêrî derbirîna ramanên têkil yên bazirganî, helbest û ayînê dihat. Nexşên li ser ber û keviran, nexşên here kevinin ku hatine dîtin. Dema wan vedigere sala 3600 b.z. Tabloyên ku ji ĥeriyê hatine duristkirin li dor sala 3200 b.z. têne xuyakirin. Wisa diyare ku Sûmeran hên ji wê demê da di vê vedîtina (kifşkirina) nirxdar da aramiya derûniya xwe dîtine û pêwîstiyên xwe pê çareserkirine**"[1].


(Tabloyeka nivîsîna mîxî sûmerî)

Rola nivîsînê di tomarkirina zanînê da, di birina wê da ji welatekî ta welatekî din û ji nifşekî ta nifşekî din nayê veşartin. Piştî vedîtina nivîsînê, helbet tiştekî suriştî bû ku Sûmerî bala xwe bidin hînkirinê jî. Wan hên ji sala 3000 b.z. da xwendegeh û dibistan damezrandine, ekol û rêbaz jêra danîne. Ji gerînendeyê dibistanên sûmerî ra "hosta" û "bavê dibistanê" digotin, û ji mamosta ra digotin "birayê mezin". Ji şagirt ra jî digotin "lawê dibistanê" û ji çavdêrê rêk û

pêka karê dibstanê ra digotin "xwediyê qirbacê". Ji bo şagirtan kardayîn (peywir) jî hebû ku diviyabûn di dema dervayî dibistanê da pêkbînin. Di pey ra bi hînkirin û dibistanan ra êdî pirtûkxane jî peydabûn[2].

## Wêje û huner:


Bermaya wêjeyî sûmerî têvel (cihêreng) û dewlemende. Em di wê da strana evîndariyê ya yekem dibînin. Ew straneke, ku keçekê ji evîndar û malxiyê xwe padîşah *Şûsîn* ra diyarî kiriye; di stranê da hatiye:

**Ey zava, evîndarê dilê min!**
**Camêriya te qeşenge, şêrîne wek hinguv!**
**Ey şêrê min, evîndarê dilê min!**
**Camêriya te qeşenge, şêrîne wek hinguv!** [3]

Ev şêwazê helbesta evîndarî nîşana wê yekê ye ku jina sûmerî ne zorlêkirî bû, li ba wê azadiya derbirîna hestên wê hebû. Ev yek stranên evîndariyê di bermaya me ya kurdî (şaxê Kurmancî) da tîne bîra mirov; wek destanên *Memê Alan* (Mem û Zîn), destana *Dewrêşê Evdî* û hwd. ku bi awayekî yekser hestên xwe yên evîndarî didin xuyakirin. Dostê min, mamosta Celal Zengabadî dibêje ku ev diyarde di bermaya herdu şaxên Soran û Lor da jî heye. Min li hember wê di bermaya erebî kevin da (pêş Îslametiyê) tiştekî wisa nedîtiye. Xwezî me di vî warî da bîr û baweriya kesên zana derbarê wêjeya farisî û turkî ya kevin jî bibihîsta.

Li tenişt helbestên evîndarî di wêjeya sûmerî da, helbestên xemgînî li ser miriyan jî hene, û helbestên wek destana Galgamêş jî. Li hêla din, çîrokên li ser zimanê jîneweran û helbestên pesna xwedayan û lavijên ayînî jî hene. Herwisa wêjeya aqilmendî û pendên ku doza rewişt û tîtalên payebilind dikin jî hene. Ev wêje ji pendên Misiriyan kevintirin. Hin nimûne ji wêjeya aqilmendî û pendên pêşiyan evin:

- "**Rêz û hurmetê ji peyva dayîka xwe ra bigire wek ku rêz û humetê didî peyvên xwedayê xwe!"**
- **"Heger dostanî rojekê berdewam dike, xizimatî herdem berdewam dike!"**
- **"Hên rovî negirtiye, jêra rekeh (qefesê) amade kiriye!"**
- **" Kesê ku dest ji şer berde berî ku bi dawî bibe, wê nikaribe di aştiyê da bijî!"**
- **"Welatê ku biçekkirina xwe lawaz be, nikare bera dijmin ji ber deriyê xwe bide.**
- **"Ji kesê xizan ra mirin baştire, heger nan hebe xoyê tineye, heger xoyê hebe, nan tineye!"**
- **"Ez hespekî resen û başim, lê hevalê min qantire. Hîngê divêt ez erebaneyê bikişînim û qamûş hilgirim!"**[4]




(Galgamêş û Enkidu Hembaba parêzvanê daristanê dikujin)

Helbesteka sûmerî heye, di dema Kaşşiyan da hatiye tomarkirin. Mijara wê li ser mirovekî xwedahez, dewlemend û di dewletê da xwedî asteka bilinde. Ji nişka va, padîşah jê tore dibe û wisa bextewarî û kamiraniya wî dibe dojeh:

"... **ez bûm yê ku wek payebilindan dimeşiya, niha hînbûme çawa xwe vedizim û rûyê xwe veşêrim / ez xwedî asteka bilind bûm, niha bûme kole / ez di nav xizimên xwe da - tevî ku pirin jî - bi tenha serê xwe mame û tikes min napejirîne / kes di rê da li min guhdar nake / xelkên bajêr rûyê xwe ji min badidin wek ku ez dijminek bim / dostê min bûye dijminê min / û hevalê min bûye îblîsekî hîlebaz / dostên mina here hêja jiyana min dixin metirsiyê / û koleyê min li civatan dijûnan dide min / xelk nav û dengê min reş dike / nasên min, dema min di rê da dibînin, diçin aliyê din / malbata min wisa dike, wek ku ez biyanî me**"[5].

## Hin mijarên şaristanî gelemper:

Pêşketina şaristaniyê li welatê Sûmer hemû warên jiyanê digire nav xwe. Endesyaran bend û cokên avê durist kirine. Di warê kar û barên çandiniyê da çîneka pispor peyda bûye. Dibistanên ji bo hînkirina çandiniyê, duristkirina madenan û bi taybetî jî mis (baqir) hatine damezrandin. Dolab û erebeyên bi çar dolaban, kelekên ku bi ba diçin, duristkirina boyaxê, nawelên xeml û xêzê û bihnên xweş hatine vedîtin. Ji dar û beran, ji giya, goşt û bezê heywanan û hin tiştên din di duristkirina dermanan da bi karanîne. Bazirganiya dervayî geş bûye û Sûmeran dar, ber û madenên wek zîv, zêr û kevirên giranbiha ji welatên din anîne. Li deştên Mêzopotamiyayê ev daring û kereste pir kêm bûn[6].



(Hin erebeyên Sûmeran)



(Civata vexwarina bîreyê li Sûmer)

Ji bilî wê, Sûmeran bajar damezrandine, qesir û perestgeh avakirine, qentere, qab û stûn duristkirine. Mûzaîka rengîn bi karanîne, peyker û nîgar çêkirine, yekemîn notên mûzîkê vedîtine, nawelên mûzîkê yên têlî wek qanûn û biziq, herwisa nawelên mûzîkê yên pifkirinê wek nay û ergol (pîkên bi du qamûşan), nawelên mûzîkê yên lêdanê wek defên mezin, dimbilbaz, çang û zîle durist kirine. Sûmeran sirûd û lavij xwandine, stran û destan û stranên şeran jî gotine[7].



(Gitareka sûmerî)

Sûmeran nîzama şêstpar vedîtine; wan saet kirine 60 xulek û xulek jî kirine 60 çirk; roj kirine 12 saet û meh jî kirine 29 yan jî 30 roj; sal jî kirine 12 meh. Meha 12-an meha berhilanînê bûye (Îtî Şîgurto). Ev peyv gotina me ya kurdî "şixre" tîne bîra min, dema ku gundî genim û ceh ji zeviyan, li ser pişta sewalan tînin ser beyderan[8].




(Hin amanên Sûmeran)

Dîrokzan *William James Durant* derbarê şaristaniya Sûmeran dibêje:
**"Ev şaristanî ji hunerên destpêkî û hin caran jî pisporî pêkhatibû. Li wî welatî - bi qasî ku em di dema niha da li ser dizanin - em dewlet û emperatoriya here pêşîn dibînin; herwisa yekemîn nîzama avdanê, yekemîn bikaranîna zêr û zîv ji bo nirxandina berheman, yekemîn peymanên bazirganiyê, yekemîn nîzama sîgurtê, yekemîn pirtûkên zagonê û cara yekemîn bikaranîna nivîsandinê bi awayekî berfireh. Herwisa yekemîn gotûbêja afirandin û Tofanê, yekemîn dibistan û pirtûkxane, yekemîn wêje û helbest, yekemîn duristkirina keresteyên xeml û xêzê, gerden û bazinan, yekemîn kolandin û nexşên bi huner, yekemîn qesir û peyker û yekemîn bikaranîna madenan ji bo tekûzkirina xanî û xemlandina malan.**



(Peymana firoştina koleyekî û malekê li Sûmer)




(Belgeya jimartina ceh di heyama padîşah Ûrkagina da 2350 b.z.)

**Em li vir di avakirina xaniyan da yekemîn peymana xaniyan, yekemîn qentere û yekemîn qube dibînin. Û dîsa li vir cara yekem di dîroka naskirî da, em hin nebaşiyên şaristaniyê bi awayekî berfireh dibînin: Koletî û zordarî destpêdike û herwisa desthilatdariya oldaran û şerên dagîrkirina welatan**"[9].



(Amaneka sûmerî di nava wê da xaçû ariyanî yê naskirî)

Di rastiyê da, Sûmerî li Rojhilata Navîn avakerên şaristaniyê ne, û pêkanînên wan yên şaristanî gelek hêja ne. Tiştê ku me li vir pêşkêş kir tenha beşeke ji gelek tiştên pir. Divêt em bi bîrbînin ku piraniya van afirandinan di dema 3600 - 2500 b.z. da hatine xuyakirin, û welatê Sûmer di sedsalên piştî wê ra bûye nawenda ronahiya şaristanî ji bo hemû gelên rojavayê Asiyayê yên din.

Çarşemb, 21.10.2015

## Jêder

[1] William James Durant: Çîroka şarstaniyê, 1/232.
[2] Wadi'h Bashur: Sûmer û Akkad, rûpel 93, 94, 100.
[3] Komek nivîskaran: Dîwana efsaneyan, rûpel 127.
[4] Komek nivîskaran: Dîwana efsaneyan, rûpel 151, 152, 153, 346, 348.
[5] Fadil Ebdulwahid Eli: Ji Sûmer ta bi Tewratê, rûpel 297-298.
[6] Wadi'h Bashur: Sûmer û Akkad, rûpel 84.
[7] Wadi'h Bashur: Sûmer û Akkad, rûpel 84-86.
[8] Wadi'h Bashur: Sûmer û Akkad, rûpel 84, 88.
[9] William James Durant: Çîroka şarstaniyê, 238-239.